EM JI TÎRORÊ NALERZIN Û WARÊ XWE ÇOL NAKIN

Dr. Rizgar

Pêşkeftina civaka mirovî di hemû waran de; aborî, teknolojî, ragehandin û yasayî htd. sinor bo pêş ve paldan, heger nebêjîn êkcarî nehêlan.

Berî niho, digotin vê pêşkeftinê cihan biçûk kir û weku gundekê lêkir. Lê, di bin sîbera pêşkeftina evro de ji gundî jî biçûktir lêhat. Ya bûye avahiyeka çend nihomî.

Bê guman ev pêşkeftine û guhorînên li gel xwe peydakirî, bûyîne sedema herifandina dîwarên wan zîndanan yên ku koledaran ava kirîne. Li ber bizav û pêkolka gelan ber bi rojeka geş, ber bi binpêkirina zordarî, koledarî û azadiyê de.

Ger li mifayê vê guhorînê, yan bi kêmî guhorînên fireh bikolîn, şîrove bikin, bêzehmet bigehîne encama ku nahêne hesêpkirin. Ji ber ku êdî kes nema bikare dengê hewar û qêrîna hejar û bindestan asê bike û sinora li pêş bizava wan rabikêşe.

Bi gotineka din sîstemên totalîtar nema bişên gelên lawaz û bêrêk bixin bin gefan û nehêlan û qirkirinê ve. Ji ber ku gelek sanahî dengê wan digehe civaka mirovayetiyê û xêrxazan. Lewra qada yariyê li ber tixûmperêz û hovan teng dibe. Bi çek û amîrên berê neşîn jiyê xwe dirêj bikin. Bi tepaserkirina hejar û lawaz û bêzaran.

Lê, li gel van guhorînan sîstemên tixûmperêz û bûgen wan jî mifa ji hindek refên wan yê dîtî. Bi dapoşîna sîma û rûyên xwe karanîna amîrên taze hemû ji bo dirêjkirina jiyê desthelata xwe.

Ji wî çekê nû yê evro, ew li dijî gela bi kar dihînin tîrore; ji ber ku ne refek tenê bi kar dihîne rewişteka cîhanî ya wergirtî, ango tîror agireke yê berbûye giyanê mirovayetiyê û yê gefeka rasteqîne li ser aştiya cîhanê dike. Ango hemû yên evro ketîne ber gefa tîror û tîrorîstan, cihû qeware nîne ji bihê parastin, heger delîve bo hebe. Ji ber hindê erkê hemûyaye êk bigirin berûkek berfireh dirûst bikin, da ku şiyan hebin sikrek mikûm û fireh li pêş tîrorê ava bikin. Bê guman gelên lawaz karîgeriya xiraba tîrorê li ser dê pitirbe. Ji ber ku bêderametî û şiyan seqayek pozîtîf bo peyda dike. Lê eve ramana hindê nade ku gelên hêz û şiyan heyîn jê parastîne û rohntirîn û

nêzîktirîn nimûne; rûdana Newyorkê ya sala 2001-ê li Emrîka. Carek din dibêjîn gelên lawaz pitir dê zerar û ziyanê jê bibînin.

Li vê derê dixwazim li ser karê tîroriyê yê hov û dirinde li devera Şingalê diristî li komelgeha Girizêr û Sîbaşêxidir rûdayî û bûye egera ji destdana nêzîkî 500 welatiyên bê guneh. Behra pitira wan biçûk, pîr û jin bûn. Li gel birîndarbûna jimareyeka mezin. Guneha wan ew bûn Xwedê ew dabûn kurd û li ser axa Kurdistanê. Ev saxlete bese bo tîrorîstan wî karê hovane encam bidin.

Armancên serekî yên vî karê bê wijdan; tirs û lerzê bixin li nav dilên xelkên wê deverê da ji bo hindê hal û mal û milkên xwe bihêlin deverê çol bikin. Ango merem mişextkirina xelkên deverêye, bi wan karên dirinde. Paşku tixumperêsta zanî, êdî wan rêkên berê, hewên Enfal û jenosîd htd, şiyan nînin êdî me neçar bikin, erdê xwe bihêlîn weku caran bi serê me dianîn, li ber çav û guhên wan rêkxirawên evro xwe bi xêrxwaz dibînin, bê teklîfa xwe bikin, tenha fatheyekê bo qurbaniyên wan karan bixwînin.

Tixûmperêstan, bi tektîk û amîrên xwe guhorîn û çekên hêz di destên wan de evro tîrore. Lê derbareyî encama serbûra jiyanê wesa girove dike, ji ber ku tenha refên lawaz ber bi tîrorê diçin û tîrorê dikine çekek bo êşandina gelan. Lewra dibêjîn bê encame ji bo wan yên bi kar dihînin. Nimûne nîne li cihekê yan li qawareyekê layenek hebe, şiyabe wxe ferz bike û dewamê bide desthelata xwe bi karên hov û dirindeyê tîrorê.

Lewra dibêjîn merama wan ya ji xwe ye û bi cih nayê, gelê me xwe ragir, fedekare, bêhnfirehe û bi rewişte, revîn bo nabe û war û cihên xwe çol nake, mişext nabe. Ya di vî warî de alîkar ji bo xelkê deverê, ew hevderdî û piştevaniya gelê Kurdistanê bi hemû tex, çîn, ayîn û ayînzayên xwe ve. Li wan hejaran kirî xwedan, bigire ji dana xwînê û komkirina alîkariyan ne li pişka başûrî tenê, belku li parçên din jî, sereray rêgiriya welatên desthelat yên zordar.

Tîrorist dizanin ku dezgehên heyîn bişên wan hejaran biparêzin û li dûv wan bigerin û destgîr bikin, ber bi dadgehê rabikêşin, sizayê pêdivî bidinê û asayîşa deverê seqamgir bikin, sererayî dijwariya kawdanan û hebûna astengan